

„NOW! Ne bêyî Me“

Piştgirêdana bi xwe ya
penaberên kêmendami û
xizmên wan



Ji astengiyan re na, ji tevlîbûnê re erê

Penaberên kêmendami her roj bi astengiyan re rû bi rû dimînin. Lê astengiyan mirovan dûrdixînin ji ber ku ew beşdariya wan sînardar dikin. Piştgirêdana bi xwe ya „NOW! Ne bêyî Me“ dixwaze astengiyan rake.

Penaberên kêmendami gelek caran rastî cudakariyê tên. Hêz û jêhatîbûnên wan têne înkarkirin. „NOW! Ne bêyî Me“ dixwaze vê yekê biguherîne. Em dixwazin ji aliyê siyaset û rayedarî û meqaman ve û her wiha ji aliyê civakê ve jî cidî bîn girtin.

„NOW! Ne bêyî Me“ ji bo tevlîbûna penaberên kêmendami xebatê dike. Divê ew bibin ayidê Almaniyê. Her wiha divê ew jiyaneke xweser û mirovahî bimeşînin. Ev armanca „NOW! Ne bêyî Me“ ye.



Ziman astengek e

Asteng berbestekî ye. Ji bo nimûne, ziman dikare bibe asteng eger mirov nikaribe pê biaxive. Penaberên kêmendami divê pêşî fêrî Almanî bibin da ku karibin beşdarî civakê bibin. Lê ji bo kesên ku kêmasiya wan ya dîtinê heye, wek nimûne, kursên ziman pir hindik in. Heya îro ji bo kesên ku kêmasiya wan ya îdrakê heye, kursên ziman tunene. Ziman di navbera wan û civakê de weke astengekê radiweste.

Em ji bo civakek berfireh dixebitin

„NOW! Ne bêyî Me“ piştgirêdana bi xwe ya penaberên kêmendamiya e. Em bi xwe penaber in û kêmendamiya me heye. Ji dema hatina me ya Almanyayê ve em rastî astengiyên tî. Lê em di koma xwe de têgihîştin û hevgerîna dibînin. Em hevûdu xurt dikin û bi hev re ji bo civakek berfireh dixebitin.

Em tiştêkî dikin ku penaberên kêmendamiya û malbatên wan li Almanyayê bikaribin baştir bijîn.



Penaberên kêmendamiya ji bo jiyana xwe li Almanyayê çî dixwazin?

Ew dixwazin bibin beşek ji civakê. Ew dixwazin bixebitin, hewcedariya wan bi derfetên perwerde û piştgiriya heye, ew dixwazin biçin konsêran an qehwexaneyan, hevaltiya bikin û alîkariya cîranên xwe bikin. Bi kurtasî: penaberên kêmendamiya wekhevîya dixwazin. „NOW! Ne bêyî Me“ ji bo vê yekê hewil dide.

Daxwaz û Pabendbûn

Em daxwaza mafê wekheviyê dikin û dixwazin rê li ber cudakariyê bigirin. Bi taybetî em banga xwerêveberiya keç û jinan dikin, ji ber ku metirsiyeke wan ya mezin heye ku civakê wan paşguh bike.

Em bi heval, cîran û komeleyên din re, bi siyasetmedar û rayedaran re jî li ser berjewendî û pêdiviyên penabêrên kêmendarm û xizmên wan diaxivin.

Em girêdayî ne bi

- gihîştina bêasteng û tevgerîn,
- gihîştina agahdarîyan û
- gihîştina karûbaran, wek nimûne di warên tenduristî, perwerdehî û kar de.

Em girêdayî jiyaneke xweser in!



Piştgirêdana bi xwe – ew çi ye?

Piştgirêdana bi xwe komeke mirovên xwedî berjewendî û mafên hevpar e. Ew rewşa xwe baştir dizanin û ji ber vê yekê herî baş dikarin ji bo berjewendî û mafên xwe xebatê bikin. Ew li hember siyaset, rêveberî û civakê berjewendî û mafên xwe diparêzin. Armanca wan ew e ku ew rewşa xwe baştir bikin.

Piştgirêdana bi xwe: Piştgirêdana bi xwe berjewendiyên hevpar diparêze, wek mînak, ji bo baştirkirina rewşa kesên kêmendarm.

Armancên me

- Tevlîbûna wekhev û jiyaneke xweser
- Bihêzkirina hevbiryarî
- Hilweşandina pêşhikum, stereotip û cudakariyê
- Xurtkirina zanînê di derbarê mafên me de



Wezîfeya me

- Em daxwaza tevlîbûn û gihîştina bêasteng dikin, wek nimûne di warê fêrbûna ziman, alîkariya bijîşkî, xanî, perwerde û kar de.
- Em zanîna xwe, nêrîna xwe, daxwaz û berjewendiyên xwe tînin nav civak, siyaset û rêveberiyê.
- Di sohbetan de em kesên kêmendamiyê û yê bê kêmendamiyê û dîroka penaberan tînin cem hev.
- Di atolye û semîneran de, di gotûbêjên bi siyasetmedaran re an jî di vîdyoklîp û podcastan de, em pirsgerêkên penaberên kêmendamiyê pêşberî kesên din dikin.
- Em beşdarî semînerên derbarê mafên xwe de dibin û zanyariyên xwe bi penaberên kêmendamiyê û malbatên wan re parve dikin.
- Ji bo mînak, em di semîneran de fêr dibin ku çawa em mafên xwe bixwazin.
- Em bi kesên ji civak û siyasetê re ramanan pevdiguhêrin û ji wan re dibêjin ka çi me eleqedar dike û çi pêwîstiya me heye.
- Em torên tekiliyê bi saziyên alîkariya ji bo kêmendamiyê û alîkariya ji bo penaberan re çêdikin ji bo ku em ramanan pevdiguhêrin.
- Em dersan didin û berjewendî û xebatên xwe dixin berçavan.

Em bi hev re dixebîtin

Herî kêr mehê carekê em beşdarî komcivîn û atolyeyan dibin. Ew bi gelemperî bi Zoom-ê pêk tên ji ber ku em hemî li cîhên din dijîn û ji ber pandemiya korona. Carinan em rû bi rû hev dibînin, mînak li Berlîn û Kolnê. Paşê Handicap International heqê rêwîtiyê dide. Hemû civînan kêmasteng in û bi çend zimanan pêk tên. Di navbera hevdiîtinên (zoom) de, em gelek caran bi hev re dipeyvîn û agahdariyê didin hev.

Di civînan xwe de em li ser mijarên ku ji bo me girîng in diaxivin. Her wiha em projeyên ku em bi wan re hev-biryarî, beşdarbûn û tevlihbûna penaberên kêmendamiyê dikin, çêdikin. Hevkariya me li ser bingeha rêzgirtin û têgihiştinê ye. Em ji hev û bi hev re fêr dibin!



Di derbarê me de

Em ji welatên cihê tên, bi zimanên cihê diaxivin, me biyografiyên cuda hene û em hemû bi salan e li Almanyayê dijîn - gelek ji me ji 2014 ango 2015'an ve. Me hemiyar jêhatîbûn, hêz, zanîn û ezmûn hene. Em cihêreng in. Û cihêrengiya me, me xurt dike!





Glossary

Gihîştina bêasteng: Ji her qada jiyane bêyî alfkariya derveyî gihîştin pêk tê. Ji bo mînak, divê mirov bikaribe bêyî pirsgirêk bigehîje her deverê, divê gihîştin ji hemî avahî û agahdarîyan re serbest be, divê her kes bikaribe her malperê bikar bîne. Tevlîbûn bêyî gihîştina bêasteng ne mimkûn e!

Tevlîbûn: Her kes parçeyekî civakê ye û divê bikaribebeşdarî jiyana civakî bibe. Divê tu kes ji ber eslê xwe an jî kêmendamiya xwe bêpar nemîne. Divê mirov weke xwe bê qebûlîkirin. Tevlîbûn ji bo vê yekê ye.

Beşdariya civakî: Mafê herkesî heye ku jiyana xwe di civakê de bi awayê ku dixwaze dizayin bike. Ew dikare li gor xwestekên xwe bijî û wek mînak, beşdarî jiyana pîşeyî, perwerdehî, çand û siyasetê bibe.

Xweserîbûn: Her kes, kêmendamiya an ji ne kêmendamiya û koka wî/ê çi dibê bila bibe, dikare biryarê bide ka ew çawa dixwaze jiyana xwe ava bike û dixwaze bi wê re çi bike. Mînak: Ez dixwazim çi hîn bibim? Ez dixwazim li ku bijîm?

Ev weşan jî heye bi:

[Deutsch](#) ↗ [English](#) ↗ [عربی](#) ↗ [فارسی](#) ↗



Beşdar bibin!

Ma hûn dixwazin bibin beşek ji piştgirêdana bi xwe ya „NOW! Ne bêyî Me“? Em dixwazin bêtir penaberrên kêmendami û xizmetên wan teşwîq bikin ku beşdarî koma me bibin.

Koma xweparastinê „NOW! Ne bêyî Me“ ji hêla Handicap International ve wekî beşek ji projeya „Empowerment Now“ tê koordînasyon kirin. Ji bo bêtir agahdarî û vebijarkên têkiliyê, ji kerema xwe biçin rupela.projeya.me.



Empowerment Now tê fînanse kirin ji hêla



Die Beauftragte der Bundesregierung
für Migration, Flüchtlinge und
Integration